
*Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)*


*wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*

# Tîrêjên Çarşembê

## Xelek - 23


## Pêşiyên Kurdan yên zagrosî
## (2) Êlamî: Dîrok û şaristanî

### Dîroka Êlam:

Dîroka *Êlamiyan* - wek dîroka *Sûmeran* - vedigere dawiya hezarsala 5-an b.z. Şûn û cihê welatê *Êlam* bi deştên xwe yên berhemdar, bi çemên xwe yên pir û bi rêyên xwe yên bazirganiyê bûn alîkar ku *Êlam* bibe padişahiyeka girîng hên ji dor sala 2850-î b.z. da. Hêjayî gotinê ye ku em bêjin rêya bazirganiyê ya sereke ku ji Mêzopotamiyayê ber bi rojhilat da diçû di ber bajarê Sûsa - paytextê Êlam ra derbas dibû[1].




Sînorên padîşahiya *Êlam*, li gor rewş û mercên siyayî yên welatên cîran, hin caran fireh û hin caran jî teng dibû. Di hin heyaman da, ji Îsfehanê li bakur bigire heya bi kenarên rojhilat yên kendava Sûmerî (farisî) û herêma Xozistan jî di nav da, û ji rojhilat da, ji biyabana Îranê da bigire, Deşt-Meyşan jî li başûrê Îraqê di nav da. (Dibe ku bi kurdiya başûr maneya xwe deşta miyan be. Di demên kevin da hate erebkirin û bû Dest-Meysan û di dema nû da hate erebkirin û nav lêkirin El imareالعِمارة )[2].




Şûna padîşahiya *Êlam* ya geo-siyasî hêşt ku pir caran bi cîranên xwe ra têkeve kefteleft û dijberiyê. Ew li dijî dewlet-bajarên *Sûmeran* kete pir şeran. Di pey ra jî li dijî *Akkadiyan* ku welatê *Sûmeran* dagîrkirin. Piştî wê li dijî *Babiliyan* jî yên ku ketin cihê *Akkadiyan*. Herwisa bi cîranên xwe yên zagrosî yên bakurî ra jî wek *Lolo* û *Kaşşiyan* (ji pêşiyên Kurdan) kete şer û dijberiyan. Li dijî *Aşûriyan* jî kete şer. Hin caran li dijî dijminên xwe bi serdiket, lê hin caran jî dibû armanca talankirinan ji hêla padişahiyên cîran va. Di hin heyamên din da jî bi cîranên xwe ra di aştiyê da bû û hin deman jî bi hin padîşahiyan ra dikete hevpeymanan li dijî hinên din[3].

Bala padîşahên *Aşûr* pir li ser wê yekê bû ku her padîşahiyeka li rojavayê Asiyayê dijber be wê biroxîne. Ji lew ra tiştekî surişţî bû ku padîşahiyeka bihêz wek ya *Êlam* ji bo wan bibe armanc ku wê biroxîne, li ser deştên wê, li ser berhemên wê yên avî, li ser berhemên wê yên madenî wek mis (baqir), bironz û kevirên giranbiha û rêyên wê yên bazirganiyê deshilatdar be. Padîşahê aşûrî *Senĥerîb (Sennacherib)* di sala 695-an b.z. da ji hêla deryayê va padîşahiya *Êlam* talankir. Piştî demekê *Êlamiyan* bersiv da û di bajarê *Babil* da êriş anîn ser wî. Lê belê, ew li dijî wan biserket. *Senĥerîb* bi dirêjahiya heft salan şerê *Êlam* kir. Ev jî belgeya wê yekê ye ku *Êlamiyan* bi dilêrî û qehremanî li ber xwe dida. Piştî ku *Senĥerîb* kate kuştin, kurê wî *Asurĥadon (Assurhadon)* padişahiya *Êlam* talankir[4].

Di dema padîşahê aşûrî *Aşûrbanîpal (Ashurbanipal)* da (kurê Asurhadon), padîşahiya *Êlam* kete bin metirsiya here mezin. Vî padîşahî pir caran eriş bire ser padîşahiya *Êlam* û *Êlamiyan* jî her car bi dilêrî li ber xwe dida. Di sala 640 b.z. da *Aşûrbanîpal* dikarîbû hêzên *Êlamiyan* bi temamî bişikîne, paytext Sûsa dagîr bike û "**gencîneyên wê bistîne, perestgehên wê biroxîne, perestvanên wê dîl bike, tabûtên gornên padîşahî veke û hestiyên wan jî, her tiştî bibe welatê Aşûr, daku ji dîrokê ra di welatê wan da şopa wan nemîne - wek ku wî gotiye - û wisa vî padîşahê Aşûr dawiya padîşahiya Êlam anî**"[5].



Leşkerê Aşûr bi rêveberiya Aşûrbanîpal bi darê zorê dikevin Sûsa

*Aşûrbanîpal* ev sezayê mezin da *Êlamiyan* ji ber berxwedana wan û qehremaniya wan di şer da û ji ber zererên mezin ku wan gihande hêzên *Aşûriyan*. *Aşûrbanîpal* lekên leşkerî yên êlamî ji wir rakirin û teve hêzên xwe yên leşkerî kirin, da ku wan ji bo xwe di şerên *Aşûriyan* da li dijî padîşahiyên din bi karbîne. Ev jî belegeya wê yekê ye ku hêzên *Êlamiyan* di şer da pir navdar bûn. Bi vê kiryarê xwast ku rê li ber wê yekê bibire ku ji pêra ti serleşkerekî êlamî hewl nede hêzên *Êlaman* bicivîne û li dijî *Aşûriyan* berxwedanê bike[6].

Em dikarin bêjin ku ev talana aşûrî ya dawî ji bo padîşahiya *Êlam* bû lêdana here mezinP; ku piştî wê êdî nema dikarîbû hêza xwe vegerîne. Di nîveka sedsala 9-an b.z. da *Faris* gihîştin rojava û başûrê gola Ûrmiyê. Piştî wê bi 150 salî hin bi hin, bi başûr da, ber bi axa *Êlam* da hatin û li dawiyê, li sînorên wê yên bakurî, li herêma *Parsûmaş (Parsumash)* bi cih bûn. Di destpêkê da ew di bin serperiştiya *Êlaman* da bûn. Lê belê, ji ber talana aşûrî ji *Êlam* ra ku padîşahî pir lawaz bûbû, rê ji *Farisan* ra vebû ku hin bi hin herêmên *Êlam* dagîr bikin. Di vî warî da sûd û mifa (feyde) ji wê yekê didîtin ku ew ser bi padîşahiya *Madan* bûn û padîşahiya *Madan* li dijî van bizavên wan ranediwestiya. Di dawiyê da, padîşahê farisî *Guhreş (Koresh)* ku ser bi padîşahiya *Madan* bû, bajarê Sûsa kire paytextê serdariya xwe. Bi vî awayî padîşahiya *Êlam* bi temamî hate vemirandin[7].

## Şaristaniya Êlam:

*Êlamiyan* şaristaniyeka geş pêkanîne. Şaristaniya *Sûmer* û *Êlam* ji şaristaniya Misirê kevintire. Hin dîrokzan dibînin ku şaristaniya *Êlam* bi bandora şaristaniya *Sûmer* pêkhatiye. Di şaristaniya *Êlam* da hunera avakirina avahî, Zaqor (perestgeh) û peykeran gelek geş bûbû. Perestgehên wir jî gelek dişibihin perestgehên *Sûmer*. Di civaka êlamî da rola jinan gelek bilind bû û zimanê *Êlam* di qada herêmî da ji zimanên girîng bû heyanî piştî têkçûna vê padîşahiyê jî. Ji lew ra *Nexşa Behîstûn* di dema padîşahê farisî *Darayê Yekem* da (521 - 486 b.z.) hem bi farisiya kevin, hem bi zimanê êlamî yê dereng, hem jî bi zimanê babilî hatiye nivîsandin[8].



Zaqora (perestgeh) êlamî

Dîrokzan William Durant gotiye ku "**gelê Êlam yek ji şaristaniyên pêşîn û here naskirî di dîroka cîhanê da pêkaniye. Zaniyarên Arkêologiyê yên Fransiyan di herêmên Êlamiyan da pir şopên mirovî dîtine ku dema wan vedigere bîst hezar sal. Herweha belgeyên wisa dîtine ku pêkhatina şaristaniyeka pir pêşketî piştrast dikin ku dema wê vedigere sala 4500 b.z. Li ba wan nivîsîna pîroz, belgeyên bazirganî, neynik, berdilk û gerdenên jinan hebûne, û bazirganiyeka ku ji Misirê heya bi Hindê pêkdihat hebû. Em li ba wan ... guldankên bi temamî gilover û xweşik hatine duristkirin dibînin, li ser wan bi hunerî hin dirûvên endesyarî, wêneyên spehî û rindik ku lawir, kulîlk û daran dinimînin hene**"[9].



Jineka êlamî teşiyê dirêse û li pêşiya wê amanek ku masî têda ye heye

William Durant dîsa dibêje ku dolabên erebeyan yên here kevin li *Êlam* hatine dîtin û belgeyê şaristaniya *Êlam* ew samanê pir mezine ku *Aşûrbanîpal* bi dest xwe va anî û talan kir; di nav da "**pir zêr û zîv, kevirên giranbiha, gewherên padîşahî, cil û bergên bi nirx, aman û pêwîstiyên malan yên pir nirxdar û erebeyên ku dagîrkeran li pey xwe xuşandin û birin Nînewa hebûn**"[10].

Û niha Kurdên Bextiyarî, Kurdên Lekî û Kurdên Lir (Lor) li warê pêşiyên xwe yên êlamî dijîn, çi li aliyê ku ji hêla Îranê va hatiye dagîrkirin û çi li aliyê ku ji hêla Îraqê va. Lor di

hundirê Îraqê da bi navê Feylî têne naskirin. Heya niha jî şopên şaristaniya *Êlam* ya resen bi aşkereyî di mûzîka wan ya nuwaze da maye ku ev beşê neteweya Kurd pê tê naskirin.




Çarşemb, 02.09.2015

## Jêder

---

[1] Georg Ro: Îraqa Kevin, rûpel 36.
[2] William Langer: Berfirehiya Dîroka Cîhanê, 1/92. Ehmed Fexri: Hin Lêkolîn di Dîroka Rojhilat ya Kevin da, rûpel 198. Hesen Muhemmed Muheyeddin El Se'di: Di Dîroka Rojhilata Nêzîk ya Kevin da, rûpel 241.
[3] Taha Baqir: Dîroka Îranê ya Kevin, rûpel 27, 28. Tewfiq Suleyman: Hin Lêkolîn li Şaristaniyên Rojavayê Asiyayê yên Kevin da, rûpel 148. Georg Ro: Îraqa Kevin, rûpel 217. Gean Bottéro û kesên din: Rojhilata Nêzîk, Şaristaniyên Destpêkî, rûpel 112. Ebdul Hemid Zayed: Rojhilata Hemdem, rûpel 548.
[4] Hesen Muhemmed Muheyeddin El Se'di: Di Dîroka Rojhilata Nêzîk ya Kevin da, rûpel 189, 190.
[5] William Langer: Berfirehiya Dîroka Cîhanê 1/92. Muhemmed Beyyumi Mehran: Dîroka Îraqê ya Kevin, rûpel 428.
[6] Hesen Muhemmed Muheyeddin El Se'di: Di Dîroka Rojhilata Nêzîk ya Kevin da, rûpel 193.
[7] Maurice Croissier: Dîroka Şaristaniyên Cîhanê, 1/214. Ebdul Hemid Zayed: Rojhilata Hemdem, rûpel 600. Muhemmed Beyyumi Mehran: Dîroka Îraqê ya Kevin, rûpel 460.
[8] William Durant: Çîroka Şaristaniyê, 1/188. William Langer: Berfirehiya Dîroka Cîhanê 1/91. Ebdul Hemid Zayed: Rojhilata Hemdem, rûpel 552-560. Sabatino Muscati: Şaristaniyên Samiyan yên Kevin, rûpel 249, nîşe 6.
[9] William Durant: Çîroka Şaristaniyê, 2/11
[10] William Durant: Çîroka Şaristaniyê, 2/12.